Heval bavê Pêşrew: Mirin giyanê germ sar nake

Mixabin, roja rêwitiya bavê Pêşrew me xatir ji hev nexwestin li balefirgehê. Pişti bêtirî deh salan, felekê berê me da balefirgehê da ku em, xemgîn û dilşikestî, bendewarî bavê Pêşrew bin. Bendewarî laşê sar û bê liv bin.

Xwezî em bendewarî giyanê germ û devê bişrtî bana, xwezî tu vegeriya nav refên xwe, dîsa me civat û şevbuhêrk bi hevre bibûranda.

Rindiyên bavê Pêşrew pirbûn; lê ez dixwazin dudiwan bînim zimên: Ciyê kînê di dilê mamoste Edîb de tunebû; tu caran ewî kîn li ser kesekî ne digirt; ne jî tu caran nêrîn û helwestên xwe li ser kîndarîyê avadikirin. Bi rastî, tenê mirovê mezin dikare dilê xwe ji kînê pak bike.Mamoste Edîb dildarê zimanê kurdî bû; bi şêweyek pir delal di xwend û dinvîsand.

Her dem wêneyê wî li ber çavên mine, roja ku yekemîn hejmara belavoka NEWROZ ê bixwe re anîbû; ewî, mîna mendalek bêpar ku diyariyek giranbuha wergire, belavok bi şadî û dilgermî li ber me vekir, û, tevlî êşa canê xwe, dikarîbû ji kêfa bi fire.

Heval bavê Pêşrew, laşê teyî sar dê di hembêza axa çiyayê kurmênc de germ bibe û giyanê teyî germ û bi hêz dê her dem haveynê şiyanê be di dil û giyanê hevalên te de derx û kat bide.

Hevalê te Kovan Omer

Dumahîk : Koçberkirina hevalê hêja ….

3- Gotina partiya mamoste , Partiya yekîtî Ya Demoqrat a Kurd Li Sûriyê .

4- Gotina rojnama ku , nemir demezrevanên wê " Newroz " .

5- Gotina rêxistina kobaniyê ya P.Y.D.K.S .

6- Gotina xwediyên nemir , zavê wî mamoste Selah Berwarî got .

7- Du helbest bi zimanê Kurdî .

8- Gotina birayê wî mamoste Ibrahîm .

Di hemi gotinên hatine xwendin de , xebat , xeyset û sinciyên xebatkarê me diyar dibûn û xebata herkesê di ber doza gelê xwe de bike , gel ji bîr nake .

Li dawiyê xelkê wir sersaxiya xwedî û hevalên xebatkarê jinavmebarkirî dikin û bi dilxemgîn , çavên ziwa û diltijî viyana xebatê dadikevin .

Û dûv re bi şeş rojan berdewam, li binê sê konên sersaxiyê û li malên gelek gundiyên wî ku , malên xwe ji wê bûyerê re vekirine xelkê Kurd diçû û dihat sersaxî dixwastin û berketiyên xwe diyar dikirin .Em jî , komîta rêvebir ya rojnama Newrozê , serê xwe , Partiya wî û merivên wî saxdikin û soz didin ku , rêç û sinciyên wî bernadin